# Newroz



**Dr Nûredîn Zaza**
1919- 1988



**Osman Sebrî**
1905 - 1993

*Xebat ji bo* : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê* - YEKÎTÎ

**Hejmar ( 93 ) sal 16 Tebax 2010 z - 2622 k Buha ( 15 )ps**


## Nameya Toto ji Erdogan re …

Di rojnama Libnanî Elsefîr hejmara roja 13.08.2010 an de , mamoste Mihemed Nûredîn , weke hercar, şopandina rewşa Turkiyê û pirsa Kurd li destê xwe gerandiye û vê carê bûyereke balkêş daye xuyakirin , ew jî di derbarey nameya serokê komîta aqildaran birêz Dêzmond Toto de , bona pêkanîna çareseriyeke aştiyane ji pirsa Kurd re ye .

Toto di nameya xwe de ji serok wezîrê Turkiyê birêz Erdogan re dibêje :(Daxwaza ku em ji we dikin ew e ku, hûn hewil bidin bona pêkanîna çareseriyeke avaker ji pirsgirêka Kurd re li Turkiyê … Û serbestberdana pêşewayê parta karkerên Kurdistan ê girtî Abdulla Ocalan , dê bibe pêngaveke alîkar li ser riya çareserkirina vê pirsgirêkê ) . Herweha Toto di nama xwe de ji Erdogan re dibêje : (Piştgirî û helwestên we di derheqa pirsa Filistînî de ciyê kêfxweşiya me ye û dihêle ku, çalakiyên bona pêkanîna çareseriyeke aştiyane di navbera filistînî û îsra,îliyan de bi hêztir bibin … Hêvî ew e ku , hûn di derheqê Kurdan de jî weha bin … Pevçûnên Turk û Kurd , kuştina xort û keçên bêguneh ji herdu aliyan ciyê mixwabiniyê ye … Em ji serpêhatiya xwe – li Başurî Efrîka – dizanin ku kesek di vî şerî de wê bi ser nekeve , lewre , em ji we tika (rica) dikin weke serokwezîrê Turkiyê , hûn desthilatiya xwe bi her hawî bi kar bînin , da ku ev şerê di hudir welatê we de bi dawî bibe . Û eger hûn di vî warî de bi ser kevin D.R.(11)


**ÇIYAYÊ QEREÇOX**
Bextreşê Koç 3

**Qasimlo Y Pêşmerge**
Ebdulla Hicab 6

**Riya Ewropa di Amedê re diçe**
Enehîte Morad 9

**AGIRÊ NEWROZÊ**
Canşêrê Cinciqê 10



Email : Newroz 95 @ hotmail . com



www.arsivakurdi.org

Nûçe û Çalakî

## Ûsivê Hersan
## Koça dawîn bar kir

Sala 1918an, li gundê **Sêmitikê Newaf** , girêdayî navçeya Amûdê, Ûsivê ji diya xwe bûye, ji piçûkaniya xwe ve, dest bi kar û xebata kurdewariyê kiriye û di Komela Xoybûnê de bûye endam. Li ser destê zanyarên zimanê Kurdî, ew hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bi tîpên latînî dibe. Gelek berhem û gotarên wî di kovara Hawar, Ronahî, Roja Nû û Stêr ê de têne weşandin. Piştî damezrandina yekemîn rêxistina Kurdî li Sûriyê sala 1957an, careke din ew li kêleka xebatkarên Kurd cihê xwe digre û barê xebatê hildigre ser milên xwe. Ji ber çalakiyên wî, gelek caran ew avêtine binê zindanê û bi hovîtî ew eşkence kirine.

Roja Sêşembê 24.08.2010Z, li bajarokê Amûdê, dilê vî xweşmêrî hêja bi temenê 92 salî rawestiya. Roja Çarşembê 25.08.2010 an, bi beşdariya birek ji dost, welatparêz û aliyên Tevgera Kurdî li Sûriyê û xelkên Amûdê, termê wî di goristana bajêr de bi kul û hesret hate veşartin.



Bi vê boneya dilêş, weşana NEWROZê birûska sersaxiyê a jêrîn pêşkêşî mlbata wî kir:

**Birûska sersaxiyê**

Malbata gorbuhuşt, Ûsivê Hersan...

Bi dilekî tev kul û kovan, me nûçeya koçbarkirina zimanhez û welatparêzê Kurd ê navdar Ûsivê Hersan bihîst.

Hê ji beriya derdora 65 salan, Ûsivê Hersan ê ciwan, yê ku ji welat û zimanê dayika xwe pir hezdikir, xwe li ser destê pispor û zanan hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye û bûye aboneyê kovara HAWAR ê, ji kaniya wê ya zelal ava kurdayetî, welatperwerî û wefadariyê vexwariye û li kêleka berevan û çalakvanên doz û zimanê Kurdî cih girtiye.

Piştî damezrandina Xoybûnê, ew dibe endamê wê û bi mêrxasî erk û stubarên xwe yên netewî pêk tîne. Herwiha di warê zimanê Kurdî de jî, Ûsivê gorbuhuşt di kovarên Kurdî yên wê demê de mîna(Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr..) bi navê xwe yê aşkere gelek gotaran dinivîse.

Bila serê we sax be û cihê wî buhuşta rengîn be!

**Desteya weşana NEWROZ**
**25.08.2010Z-2622K**

### Jineke Kurd hilkişiya Çiyayê Hîmalaya û serkeftî vegeriya

Beyan Faziliya jina çiyager a Kurd a xelkê bajarê Mehabadê ku di meha Tîrmehê de bi hevalbendiya giropekî çiyager a bi navê “Ewraz” çû rêzeçiyayê Hîmalayê û karîbû wî çiyayî bibire û navê xwe wek jina çiyager a serkeftî ya Kurd di rêza lîsteya serkeftiyên çiyayê Hîmalayayê de tomar bike.

Beyan Faziliya piştî ku ji Hîmalayayê bi awayekî serkeftî vegeriya bo bajarê Mehabadê, ji aliyê akinciyên wî bajarî ve, bi germî hate pêşwazîkirin û serkeftina wê hate pîrozkirin.

Beyan Fazilî ev heşt sal in çiyager e.

### Rêjeya tund û tûjiya dijî jinê li Silêmaniyê bilind dibe

Rêvebiriya dezgeha şopandina tund û tûjiya li dijî jinê li Silêmaniyê ragihand, ku hejmara rewşên tundiya li dijî jinê li parêzgeha Silêmaniyê ji par bilintir bûye.

Rêvebirê beşê şopandinê, Beşder Reşîd got: Hejmara dozên ji hêla jinên ku rastî lêxistinê hatine di şeş mehên pêşîn ji vê salê giha 751 dozê. Di şeş mehên pêşî ji sala 2009an 603 doz bûn.

B. Reşîd ji perlemana Kurdistanê xwest ,ku ew projeyaseya rakirina tundiya malbatî pê bawerdan bidin.

www.arsivakurdi.org

# ÇIYAYÊ QEREÇOX

**Bextreşê Koçer**

Qereçox : Bêjeyek ji du beşan pêk tê , Qere : ango reş , Çox : ango paç yan çox , bi girêdana van herdu bêjeyan bi hev ve , ev bêjeye wateya çoxê reş dide .

Di çarçoveya pelemara Erebkirina navên gund , bajar , newal û çiyayên Kurdî ji aliyê desthilata Sûryê ve , navê Qereçox hat guhertin bi Kiratşok .

Qereçox , gulokek çiyayê volkaniye bilindbûna wî dighe heya 700 m li ser rûyê deryayê , dikeve li başûrî bajarê Dêrika Hemko bi 15 km an . Qereçox ne gelekî bilind e û bilindbûnek nimiz heye , sebaretî çiyayên Kurdistanê yên bilind û helemût wek Cûdî , Ararat , Sîpan û Qendîl …H.W.D . Aliyê çiyê yê bakur deştek têr çem , newal û Kendal heye, jê re dibêjin Deşta Hesina. Li ser navê êla Hesina ya Kurd , ya ji zû de li wir jiyana xwe berdewam dikin bi nav bûye , û ev Deşta , Deştek gelekî fireh e, ji çiyê berdewam dike heya dighê Ava Mezin ( çemê Dicle ) , û piraniya herêma Dêrka Hemko bi dirêjahiya 75 km an û pehnahiya 30 km î hembêzî xwe dike . Başûrî çiyayê Qereçox , xakek fireh û rast heya dighê çiyayê Şingalê, jê re dibêjin Berî. Û çiyayê Qereçox jî dirêjahiya çiyayê Bêxêre ye, yê dikeve başûrî Kurdistana Turkiyê, lê navbirek dirêj ji hejmarek girên nizim, Kendal , newal û çemê Dicle dikeve navbera wan. Û çiyayê Qereçox ji gundê Beroj dest pê dike heya dighê gundê Xana Serê û dîsa piştî navbirek kin ji Gundikê Şêxê Dîn berdewam dike û di rojava de nizim dibe heya dighê herêma Aliyan û dawiya wî dîsa dibe deştek têr çem û newal û Kendal .

Li ser serê wî raserî Gundikê Şêxê Dîn darek mezin ya Berûya bergirtî ji dehên salan ve lê heye, jê re dibêjin dara Hesê. û dibêjin mezinek herêmê bi navê Hesê ew dar bi destê xwe çandiye .

Nîşanên dîrokî hene û peyda dibin ku Qereçox û herêma xwe avane , û tevgera élan tê de peyda dibe di destpêka serdema misilmantiyê ve, û xelkên herêma Qereçox ji kurmancên Êzidî bûn ji êla Musûsan lê di

kurmancên Êzidî bûn ji êla Musûsan lê di
çarçoveya şerên belavkirina misilmantiyê di herêmê de , Êzidî ji herêmê kişyan û çûn xwe li çiyayê Şingalê girtin. Û tê zanîn ku du şerên mezin û kavilker di navbera Êzidiyan û êla Mîran de derbûne ji berya 250 salan li hawîrî çiyayê Qereçox , şerê yekem li girê seryan nêzîkî gundê Xanikê yê neha dikeve li ser keva Dicle û şerê duyem li gundê Til Xenzîr yê dikeve başûrê Qereçox bi 7 km ran , û di van herdu şeran de dehên kesan hatine kuştin ji herdu aliyan û hê heya neha jî gorên 71 qurbaniyên van şeran xuyane di goristana Xenco de nêzîkî gundê Beroj yê di keve di keva çiyayê Qereçox de , û ev herdu şere nîşanên dîrokîne li ser Kurdayetiya çiyayê Qereçox û herêma hawîrdor û hebûna Kurdan di herêma çiyayê Qereçox de . Û Qereçox di serdema Osmaniyan de bi Mîrgeha Botan ve girêdayî bû , ya sînorê wê yê aliyê başûr digiha heya çiyayê Şingalê û piştî hevpeymana Saykis Bîko di sala 1916 an de û levakirina Kurdistanê li ser çar Dewletan û her wesa Mîrgeha Botan jî hate parcekirin û beşê wê yê başûr hate girêdan bi Dewleta Sûryê ve û çiyayê Qereçox kete di hundirê sînorê Dewleta Sûryê de. Û hejmarek bûyer di herêma Qereçox de çêbûne ji wan bûyeran . Dibêjin : Hemze bekê Şikakî û êla xwe ji Kurdistana rojhilat hatine û demekê li herêma Qereçox rûniştine û kevne warên wan li gundê Hemze Bekê yê neha , di hatin xuyakirin heya demeke ne dûr jî , û dibêjin sedema hatina wan li herêma Qereçox , ji ber berdewambûna êrîş û dest dirêjiyên leşkerê Şah piştî şerê Dimdim di sala 1608 an de li ser êla wan . Û dibêjin di nav êla Şikakan de şivanek ciwan hebû , ew û dotmama xwe evîndarê hevbûn û carek ji caran çavdêriyê li destgirtiyê xwe dike û li ser latek bilind di raweste û stirana li ser destgirtiyê xwe dibêje bi dengek bilind û zelal û rind û xweş , û zilamek yê Mîrê Botan lê rast tê û dengê wê dibhîze û ji dengê wê dimîne matmayî û diçe ji Mîrê Botan re dibêje : Mîrê min : min îro keçikek Şikakî dîtiye li ser destgirtiyê xwe di stirand bi dengek xweş û zelal û nazik û min weke vî dengî xweş û zelal û nerm li tu deverên **D.R.4**

www.arsivakurdi.org

**Dumahêk**: **ÇIYAYÊ ….**

xweda ne bihîstine , û piştî şêwra Mîrê Botan bi şêwirdarê xwe re ji ber dîtina riyekê ku keçik bê û di dîwana wî de bi stirîne , Mîr radibe bi destgirtiyê wê ve rê dike û li rex xwe dihêle û mercê berdana wî dike ku destgirtiya wî bê û di dîwana wî de bistirîne , û bi dawiyê keçik û xelkên xwe bê çare dimînin û bi ber mercên Mîr re tên û keçik diçe û di dîwana Mîr de stirana dibêje û dûv re Mîr destgirtiyê wê berdide , û ji ber vê bûyerê Şikakan dîsa li herêma xwe vedigerin û soz didin ku dîtir li vê herêmê venegerin. .

Û di roja 9 / 7 / 1941 an de fermandarekî Ingilîzî û di gel hêzeke leşkerî ji Iraqê ve êrîş dike li ser Qereçox û hawîrdorê Qereçox û bi taybetî li ser gondê Ḧenêwiyê yê dikeve bakurî çiyê bi 5 km ran û Ḧenêwiyê dişewitîne û wêran dike û gelek ji xelkên wê dikuje û yên dimînin sax wan jê dide barkirin û sedemê vê kuştarê nakokiyên Kurdan bi Kiristiyanên Ḧenêwyê re bûn û ji ber parastina bercewendiyên Kiristiyanan di herêma Qereçox de .

Qereçox çiyayek kevnareye , û yê ku xweşik li ser vî çiyayî bigere gelek deverên kevnare wê bibîne , li Qereçox paşmayê bajarekî heye jê re dibêjin bajarê Zenbîl Firoş , û dibêjin ev bajare bajarê êkanebû di vê herêmê de , û hê bingeh û paşmayên avahiyên vî bajarî xuyane di nava çiyê de ji aliyê bakur ve , û di keva bajêr de şkeftek heye jê re dibêjin şikefta Zenbîl Firoşl , neha bi axê hinekê hatiye veşartin lê dema mirov diçe di ber de mirov bi qasî odekê valahiyekê di lata çiyê de dibîne , û nêzîkî bajêr çemek piçûk ji nava çiyê di herike û tê û dikeve di Sefanê Şekir xaçê de . Û li ser girekî di kûpê çiyê de ji aliyê başûr ve tirbek heye jê re dibêjin tirba Keçka Kezî , û raserî tirbê darek mezin ya Berûya heye jê re dibêjin dara Keçikê , û di milê wê tirbê de tirba Nayif Mistefa Paşa û tirbên binemala wî û yên êla wîne , û pêşmiqabîlî wî girî û di aliyê bakur de , girek dî heye di kûpê çiyê de , û tirbek li ser wî girî jî heye jê re dibêjin tirba Kurkê Riyal , û di ber vê tirbê de jî darek mezin ya Berûya heye jê re dibêjin dara Kurik .

Kurkê riyal û keçka kezî çîrokek dîrokî û filkilorî û civakiye , û ev çiroke sinciyên herî filkilorî û civakiye , û ev çiroke sinciyên herî pak û mirovatiyek herî pîroz jê di herike , bûyerên vê çîrokê bûye stiranek gelêriya gelekê xweş û delal , jê re dibêjin stirana Zenbîl Firoş , û dibêjin Zenbîl Firoş kurê Mîrê Diyar Bekirye navê wî Mihemed Seîd̂e yan Mihemed Emîne ji xelkê xwe digere û tê Qereçox û tê xwe li wî bajarê li ser serê çiyê digire , û ji ber xwe û zarokên xwe xwedî bike zenbîlan çêdike û di kolan û zikakên bajêr de di firoşe û dema Xtûn wî dibîne û zenbîla difioroşe di kolanên bajêr de û dibîne çi maqûliyek li sere , daxwazê jê dike ku bê bi pê re kêfê bike , lê Zenbîl Firoş daxwaza wê bi cih nayîne ji ber tirsa wî ji xwedayê wî heye , hê hemî Kurdên dinyayê vê çîrokê distirên ji ber gotinên wê yên xweş û awaza wê ya nerm û sivik û wateya wê ya sincî û mirovatî .

Gelek nivîskar û lêkolînvana li ser vê çirokê nivîsîne , yek ji wan lêkolînvana Sovyetî Ş . S . Wisîlyan ya peyama xwe ya diktora li ser vê çîrokê amadekiriye , û ev çîrok û filikilorê Kurdî yê zengîn cihê mat û rizamendiya wê bû . Û kesek nikare serdema bûyerên vê çîrokê sînor bike , lê ji bûyerên vê çîrokê û nêrînên nivîskarên li ser nivîsîn dibêjin belkî di destpêka serdema Osmaniyan de çêbûye . Û li ser girekê di kûpê çiyê de ji aliyê başûr ve birca xurtkirina weşana tilvizyona Suryê li ser xuya dike .

Çiyayê Qereçox çiyayek kevnareye , û gelek deverên kevnare di çiyê de peyda dibin , ji ber vê yekê di van salên dawî de ev cihên kevnare bûn armanca dizan , û gelek ji wan hatin dizîn li ser destên zilamên hukumeta Sûryê . Û gelek gund hene li hawîrdorê çiyê û di qontara çiyê de ji wan gundan , Beroj , Kaniya Dirêş , Ḧemze Bekê , Besta Sûs , Tepkê , Mêrga Mîra , Nizar , Xana Serê , Gundikê Şêxê Dîn , Robarya , Mistefawiyê û Gêrê … hd .

**Çalakiyên li çiyayê Qereçox peyda dibin .** - Çandinî : Çandinî mercek serekiye ji berdewambûna jiyanê re di herêmekê de , û herêma Qereçox ji mêj de karê çandiniyê dikirin , û çandiniyê diçandin ji berê ve Genim , Ceh , Garis û Birinc ya ku bi piranî dihat çandin li wir li ber kevên av û çeman , yên ku Qereçox zengînbû bi wan , lê neha çandiniyên li wir peyda dibin çandiniya Genim , Ceh , Nîsk , Nok û çandiniya Garis û Birinc **D.R .11**

www.arsivakurdi.org

# ( ku, ko, kû) Ji hev cuda ne

Mehfûzê mele silêman

( **Nerînek zimanewî)**

Birayên xweşewîst û serkevtî, rêvebir û nivîserên weşana NEWROZ ya hêja..

Ez silavan li we dikim, hêvîdar im hûn dilşad û serfiraz bin, piştre têbînek min li gotara ARIF ZÊREVAN ya bi navê "ferqa nêvbera **ko, ku, kû** de" ,ya di hejmara 92an , rûpelê ( **Nerînek zimanewî** )hatiye belavkirin de,heye, bi kurtî ev e:

**1-** Di nav gotarê bi xwe de şaşî hene, yek jê : ku 'ferq" gotineke erebî ye, û ew çêra zimanê kurdî dike (!!),ya diwan: ewe ku peyva "navber" ji "nêvber" dirustir e çimkî tîpa "**a** " di navan de û di hindurê axaftinê de tê şikandin wek: goştê berêz(ango: beraz) & çermê gê (ango : ga).

**2-** Avakirina gotina"zimanewî"şaş û çewt e, ne bi (kurmancî) ye, û ne bi (soranî) ye, diyare ji cem xwe, li hev siwar kiriye(!!).

**3-** Mamoste Arif çêra ziman û rêzimanê kurdî dike, û sê parê gotinên wî erebî ne (wek: mane, behs, waw, kaf, ferq, herf, esl,…).

**4-** Mamoste Arif di gotara xwe de, xwe di gelek warên rêzimên werkiriye, bêyî ku haya wî ji wî hebe, çimkî ew dûrî babetê gotara wî ne, wek: kurm , kirm, kum, kim, Kiwrd, Kurd,…, ev dikevin hindurê zaniyariya tîpnasiyê(fonîtîkê), her wekî tîpnasî jî deryake ferehe, nemaze di zimanê kurdî de, ji ber ku gelek zarav tê de hene ,û têkilî bi gelek zimanên biyan re kiriye.

**5-** Lê heçî ( **ku, ko, kû**), ew bi xwe kî tim ji hev cuda ne, û bi awane ciyawaz wate û erkên wan bi kar tên :

**a: Ku**, kîteke mercy ye bi karê "heger" radibe. ( wek : ku te xwend fêr bibe

**a. Ku,** kîteke şirovekar e , rewşê diyar dike. (wek:ez çûm, ku wa li wire).

**b. Ku**, pêşgira daçekên pirsar e.(wek: ku çi kir deyneke! * ku çawa be bibe! * ku çilobe baş e! ).

**c. Ko**, peyveke serbixwe ye, û bi zaravê hinek herêman pêk tê,wata wê jî ev e: ko=koh=kuh=ne tûj . (wek: kêra ko).

**d. Kû,** daçeka pirsan e, ber û cih nîşan dike**.** (wek: li kû ma ? * bi kû ve çû?).

**e.** Ew mînak û impazên kîta **(ku)**, ku di helbestê Ehmedê Xanê de hatibûn dirustin, lê belê zîrekî û hozaniya Ehmedê Xanê di ziman û avakirina helbestê de ( **çi, çawa, heger** ) ji dû kîta **ku** hilanîne, ne wekû ku mamoste Arif dibêje**.**

**f.** Herdû tîpên (w,i) yên bi hev ve, şûna tîpa dengdar ya kurt (u) digre, û di nav herêmeke ji kurdistana bakur de bi kar tê, lê mixabin ne dirust e, çimkî ji zimanê tirkî hatiye girtin, û di rêziman û bingehên vekîta kurdî de tune ye. Lê belê wekî ez dizanim, ku herdû tîpên (w,î)bi hev ve şûna (o)û(û) di zaravekî herêmî de digirin, (wek: gûz = gwîz * kor= kwîr * dûr = dwîr).

Li dawiyê sipsiya we dikim ,bi omîd im ku dengê min bighê we, xwendevanên we, û mamoste Arif zêrevan.


15/08/2010



www.arsivakurdi.org

# Qasimlo Y Pêşmerge

Ebdulla Hicab



21 sal bi ser şehîdbûna Dr. Abdulrehman Qasimlo re derbas bûn. Di wan 21 salan de gelek bas û şirove li ser kesayetî û rola Dr. Qasimlo di tevgera Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û nûjenkirina PDKî hatine gotin. Basa Qasimlo ê dîplomat, Qasimlo ê rewşenbîr, Qasimlo ê abûrînas, Qasimlo ê siyasetvan û H.W.D tê kirin. Dema ji bo 21 saliya şehîdbûna Qasimlo ji min daxwaz hate kirin ku li welatê Austriya (Utrîş) basekê pêşkêş bikim, cemedaniya serê Dr. Qasimlo û cilên wî yên pêşmergatiyê ji her tiştî pitir bala min kişandin. Qasimlo ê PÊŞMERGE xwediyê gelek taybetmendiyan bû ku heya niha hin ji wan di munasibetên cuda de hatine baskirin. Qasimlo ê pêşmerge bi huner, edebiyat, abûrî, siyaset, rewşenbîrî û dîplomasiya xwe PÊŞMERGEYEK Kurdistanê bû. Eger mirov bixwaze taybetmendiyên wî pêşmergeyê pêşeng, ji ”P” ya destpêkê re heya ”E”ya dawî bi kinî bas bike, Qasimlo ê PEŞMERGE xwediyê pênaseyek weha ye:

**Pêşeng**

Dr. Qasimlo pêşengê têkoşîna azadîxwaziya gelê Kurd li Rojhilata Kurdistanê bû. Ev ne bi tenê weke serokê partiyek siyasî, lê weke mamostayekê hertim ji hevkar û hevbîrên xwe re sembola xwe nû kirin, guhertin, pêşveçûn û nûjeniyê bû. Qasimlo ê pêşeng ji bo avakirina kultûra demokratîk kedek mezin da. Di demekê de ku Rojhilata Kurdistanê ji bo guhdarîkirin ji takek pêşeng amade bû, Qasimlo basî kultûra xwe bi rêkxistinkirin û demokrasiyê da pêş heya ku kultûra takperestiyê li Rojhilata Kurdistanê bi cih nebe. Di bin mercên



dijwar de ev kultûr bi lêger û astengan re rû bi rû bû, lê keda Qasimlo encam jî da û bingeha kultûrek cuda ya ku rê ji bo demokrasiyê vedike ava kir. Rola pêşengbûna Dr. Qasimlo ji kultûra siyasî bi der, warên civakî û kultûrî jî bi xwe ve digirt. Di hemû salên dijware têkoşîna azadiyê û di bin mercên zehme tû şer de, Dr. Qasimlo rê neda ku jiyana asayî ji têkoşîna partiya ku wî serokatiya wê dikir bi dûr bikeve. Qasimlo hemû rengên jiyanê dihebandin û pêşxistina siyasetê ji pêşketina civakê cuda nedikir. Lewma ji bo avakirina kultûrek li ser wê bingehê hertim di rêza pêşîn ya têkoşînê de bû.

**Êş u azara gel.**

Ji Qazî Muhemedê mezin re heya Qasimlo û Şerefkendî ê nemir, rêberên PDKÎ di jiyan û mirinê de hertim bi gelên xwe re bûne. Weke çawan Qasimlo xweşiyên gelê xwe parve dikir, di heman demê de jî ew di rêza pêşîn ya wan kesayetiyan de bû ku amade bûn ji bo xweşiya jiyana gel, bi xwe tama êş û azarê ji nêz ve hest pêbikin. Weke gelê xwe ev jî rastî koçberî û jiyana bi dijwarî hat. Li çiyan, di bin xêwetan de jiya û kete bin barana bombe û topên neyaran. Ji nêz ve şer dît u di dawiyê de jî weke hemû şehîdên gelê xwe rastî tîra dijminê xwe hat. Laşê bi xwînê xemiliye Qasimlo û hevalên wî nîşaneya herî xurt bû ku derdixist çawan û heya ku Qasimlo di nava êş û azarên gelê xwe de dijî.

**Şorişger**

Şorişgeriya Dr. Qasimlo bi tenê di wê yekê de nebû ku wî ji bo guhertina sîstema deselatdar û avakirina sîstemek nû kar dikir. Wî guhertin ji xwe û ji partiya xwe re da destpêkirin. Ji bo ku guhertinan **D.R. ( 7 )**

www.arsivakurdi.org

amade bike, Dr. Qasimlo hevbîrên xwe jî fêrî guhertinê dikirin. Weke mamostayekê ku hertim şagirtên xwe fêrî tiştên nû dike, Qasimlo hewl dida ku hevbîrên xwe bielimîne kultûrek alternatîv ku rê ji bo guhertinên bingehîn di civakê de xweş bike. Wî şoreş weke pêvajoya avakirina kultûrek alternatîv temaşe dikir.

**Mîmar**

Rola Dr. Qasimlo di ji nû ve avakirina PDKÎ de xuya ye. Weke çawan di pêvajoya guhertina qewareya qewmî re ji bo nasnameya nû ya neteweyî, kesayetiyên pêşeng weke mîmar û endazyarên avakirina qewareya nû rol dilîzin, Qasimlo jî karî hesta qewmî li Rojhilata Kurdisstanê di çarçoveya PDKÎ de nûjen bike, bixe kanalek nû û tevgerek nû ya neteweyî bîne meydanê. Dîrok her demê kesayetiyan derdixe meydanê ku pêşengiya bizav û tevgerên nû bikin. Kesayetiyên ku dîrok wan derdixe holê dikarin şopek mezin li ser pêvajoyên siyasî danên. Lê kesayetiyên ku bi xwe dîrokê çê bikin tak in. Qasimlo yek ji wan kesayetiyan bû ku karî dîrokek nû ava bike û têkoşîna neteweyî li Rojhilatê Kurdistanê bi awayek modern bivejîne û bixe ser hêla siyaseta hemdem.

**Evîndarê jiyanê**

Kêm kes weke Qasmilo hezkiriyê xweşiyên jiyanê bûn. Di gel ku wî hemû xweşiyên jiyana xwe kiribûn goriyê armanca siyasî, û jiyana xwe bi yekcarî xistibû xizmeta neteweya xwe, lê wî tu car xemlên jiyanê ji bîr nekirin. Ji pak û xawêniya tak û jîngehê re bigre heya xurtkirina kultûra jiyanheziyê. Kesên ku Qasimlo ji nêz ve nas dikirn an bi wî re kar dikirin hertim ken, dilxweşî, jiyanhezî u pîtedan bi hemû war û rengên jiyanê li cem wî didîtin. Her gulek bêhnek û her rengek xemlek bû ku tu gav ji ber çavên Qasimlo wenda nedibûn. Lewma jiyana şorişgerî û têkoşîna siyasî ji wî re rêgir nebûn ku di gel karê siyasî, bi kultûr, edebiyat, şêir û dab û edetên civak û gelê xwe re jî mijûl bibe.

**Rênîşander**

Pîvanên ku Dr. Qasimlo di siyaseta PDKÎ de bi cîh kirin, îro, 21 sal piştî şehîdbûna wî, weke çavsax û rênîşanderê rêçika siyasî li Rojhilatê di rojeva gel de ne. Qasimlo ji kultûra nefretê bi dûr bû. Lewma her derfetek ku biketa dest, bi kar dianî heya deriyekê di riya siyasî de veke. Her çend ew hewldan bû hegerê şehîdbûna wî, lê wî pîvana "di siyasetê de dostê heya dawî an dijminê heya dawî nîne" bi cîh kir. Qasimlo her weha hewl dida ku di navbera dijberiyan de û di rewşên aloz de heya li destan tê parseng an balansê biparêze.

Di gel ku wî hewl dida ku kurdên her beşek Kurdistanê bi doza xwe li çarçoveya welatê ku lê dijîn re mijûl bin, lê Qasimlo tu gav xebata hevbeşe neteweyî ji bîr nekir. Ew weke şêvirmendekê hertim bi tevgerên Kurd li beşên din yên Kurdistanê re di têkiliyan de bû û her gav ku pêwîst didît bi şêvr û şîretên xwe doza neteweyî di beşen dine Kurdistanê de bi pêş dixist. Qasimlo di heman demê de hertim bi rewşenbîr û pêşengên Kurd li beşên dine Kurdistanê re di têkiliyan de bû û ji bo avakirina kultûra hevbeş ya neteweyî rê nîşanî wan dida. Mînaka herî diyar ji karê Dr. Qasimlo bo piştgirîkirin ji karê hevbeşe neteweyî re alîkariya wî ji bo avakirina Enistîtûya Kurd li Parîsê di sala 1983 de bû ku bi hîmdariya serokê niha yê Inistitûyê Kendal Nezan, Qanatê Kurdo, Cigerxwîn, Mam Celal û hwd ava bû.

**Gelaledarêj**

Dr.Qasimlo kesayetiyek dûrbîn bû ku hem ji bo dema têde dijiya û hem ji pêşerojê re xwediyê pilanên demkurt û demdirêj yê siyasî bû. Eger hin ji pilanên Dr. Qasimlo di piratîkê de pêk nehatibin jî, lê wî tu gav bê pilan dest bi karekî nedikir. Lewma di dema jiyana Dr. Qasimlo de mijara sereke di nav rêkxistinên PDKÎ de her tim pilanên kar ji bo pêşxistina tevgerê bû.

**Efsane**

Qasimlo jiyana xwe kire goriyê azadiya gelê xwe, lê piştî şehîdbûnê bû ustûreyek neteweyî ku ji bo pêşeroja gelê xwe rastî û efsaneyê bi hev re girê dan û ji bo nivşên pêşerojê bû efsaneyek ku hertim wê di hizr û xeyala keç û xortên welat de zindî bimîne.bimîne.

*çavkanî: Duheftînameya Agirî hejmar 140*

www.arsivakurdi.org

# Riya Ewropa di Amedê re diçe

**Enehîte Morad**

Li ev çend salên dawîn, dewleta Tirk, piştî daxwaza wan ji hêla hevgirtina Ewropî ve nedihate pejirandin . Pir asteng di riya derbasbûna wan de pêk dihatin , pir merc û şîret diyarî wan dibûn , ji wan re aşkere digotin : pêwîste demiqurasî û mafên mirovan di hundir Tirkiyê de cî bigirin û doza gelê Kurd bi awakî demuqras û dadmend çareser bibe , rêzgirtina dewletên cîran nemaze dewleta Îraqê û H.W.D girîng e. Wisan jî. dewleta Tirk neçardibû, ku berê xwe bide hin guhartinan, di pir waran de gavine li pêş û şaristanî bavêje , ta ku rûyê xwe yê reş li pêş raya der û hundirbi awakî sipî bike. Belkîm di pêşerojê de, di nava hevgirtina Ewropî de cî bigre !.

vêca jî, dema mirov serlêdanekê , ji dewleta Tirk re çêdike ;Ew dîmenên şaristanî baş diyar in , heyama dewletên Ewropî bi bîra mirov tînin, ji paqyjiya kastîn û cadan de bigire ta geşkirina aborî û têkliyên civakî re derbas bibe . Hemwelatî tev li ser bingeheke rêzgirtinê hatine perwerde kirin . Hema di warê bazarganî de, ma kî nizane ku dewleta Tirk pir sûkên cîranan weke Îraq ,Sûriyê , Libinan, Misir û H.W.D ji xwe re kirine bazar û xwe têde beloq vedine. Bêgûman îro navê dewleta Tirk, di nêv dewletên Rojhilata navîn de bilind û bilind têye hildan , digel wê nirxê zimanê Tirkî her diçe bilind dibe û reng vedide, nemaze di nêv gelên Ereb de .Li vê dawiyê piştî hilweşandina rejîma dîkteror ê Îraqê Sedam , Emrîka Tirkan bi serkêşiya Receb Teyêb Erdogan dostê herî nêzîk ji xwe re dibîne.

Her diçe têkiliyên Tirkan, bi hêzên îslam û dewletên cîran weke Sûriyê û Îranê geş û xurt dibe . Vêca jî, Emerîka bi awakî dixweze , ku Tirkiye ji pêlanên Tehranê biparêze, ta ku dostaniya wan berdewam be . Îro Tirkiyê weke xêrxaz doseya çareserkirina pirsgirêka îsraîl,Sûriyê û Felestînê hilgirtiye , roleke balkêş dilîze û navê dewleta Tirk di raya cîhanê de berçav dibe !. Tevî wê jî, hevgirtina Ewropî weke endam wan napeirîne , ew jî dixwezin xwe di ser doza gelê Kurd re bavêjin , an jî bi perspanan çareser bikin .

Weke çawa pir caran , wan di ragihandinên xwe de, nîşan didin ku gelê Kurd di hundir Tirkiyê de, di xêr û xweşiyê da ye, dibistan bi zimanê kurdî ava bûne ,û ji berê û paşê ve wekhevî di nêvbera gelê Tirk û Kurdan de heye. Lê, ji ber ku Kurd nezan û bê hiş in, ji ber wê jî , ji hêla hêzên derve ve weke Îsraîl û Emerîka bi hêsanî têne xopandin û alikariya kesên li dijî hêmenî û hepîvana xaka dewleta Tirk –weke mediya Tirkan dixwaze- dikin û serêşan ji me Tirkan re çêdikin , encama wê yekê rejîma Tirk neçar dibe ku êrişên xwe bibe ser herêm û gundên Kurdan!!.

Ev nêrîna di herdû zincîrên hunerî \ Têlviziyonî \ Tirkî de(( Wadî Elizî,ab û Elerd Eltyibe de)) baş şirofe dikirin , nemaze di Wadî Elizî'ab de !? . Pir û pir pêwiste, ku em bînin zimên , ji hêla hunerî ve lehengên zincîra wadî Elizî'ab bi coşekî pir bilind rolên xwe lîstibûn, ji rola Morad Elemdar û herdû hevriyên wî Mêmetî û Ebidlhey ve bigire û ta di Îskender û Fêler ve derkeve !.

li dawî , bi kurte birîn hêvî û merema me, ku rejîma Tirk li xwe bizîvire û bi jîrekî doza gelê Kurd ne tenê bipejirîne û hew, lê belê, bi awakî demoqras çareser bike û lêborînê ji gelê Kurd bixwaze. Ji ber ku doza Kurd dozeke rewa û dadmend e , tu carî bi derew û perspanan çareser nabe ne wilo?. Nemaze çareseriya doza gelê Kurd li Tirkiyê , daxwaz û berjewendiyên Tirkan bi awakî aşkere bi cî tine. Hingê em Karin bêjin ku pêlên demoqrasî li Tirkiyê û wekihevî cî digire,û riya hevgirtina Ewropî li pêş Tirkan vekirî dimîne .

www.arsivakurdi.org

## Xemla bûkê dê li xwe kir !!!

Di dema niha de , her tişt bervaja ye . Dê ji dêvlî bibe lêvegerek perwerdekirinê , piştî vî temenî mezin ( 53 sal ) , hîn dil heye kincên bûkan li xweke . Ev yek ji sedemên derengbûna kerwana çavlê ye û çêkirin û başkirina mala Kurdî pêre di qoşê de ye . Ya dudiyan , semakirina li ber nûçeyan ya ku hin alî pê xelkê li dor xwe dicivînin e. Ew jî devçûn ji çarçewa doza dadmend e û berge ji tewanbarkirina têkildariya rêzdar e . Lewra bilmezî û danûstandina nepîvayî ya hin aliyan, dihêle ku ew di kort û keleman werbin û di her demekê de xwe avis bibînin , pir caran jî hîn qîz in . Gelo ma tu Meyrem din hene ku îse jê peyda bibin ?.

Gerku hebe ka îsayê me Kurdan ! . Lê ji bilmeziya xwe ta ku mêrkiribin jî, dîsa dergûşê xwe bi serî nakin û berdavêjin . Ev salên dawiyê yên beravêtina miletê me yê Kurd li Sûriyê ne . Sedemên ku ev rewşa peyda kiriye di nav civaka Kurd de helbet ji kilikbûna mêjî û nexweşiyên civakî yên pilankirî ji aliyê destlatên rijîma tek partî , tek malbat e .Ev komên sedem û encamên wê dihêle Kurd ne xwedî yekhelwest , yekdeng û armancine aşkere û pîvayî bin . Bi ser ve rûmeta me her dem hingavtî ye û ramanên nû her dê werine pişaltin .

Eva rewşa me ya berbat e . Keç xwe dibîne Meyrema qîz ( Ezra' ) û dê ji vê yekê xulemîş dibe . Berî ku qîza xwe bi bûk be , xemla wê bi ser bejn û bala bê bejin perpitî de berdide û temaşevan ( milet ) bi coş û dilgermî jê re li çepikan dixin . wêlomê , keça bilmez a neçar tezî dadikeve holê û serê dîlanê dikşîne . Ev dîmena jî bi çepik û lîlî tê pejirandin ji hêla nirxevanên rewşa han . Bi vî şêweyî mirov kare miletê Kurd li Sûriyê bijmêre ji miletên beravêtî , tevî ku heyam a guhartinê ye . Kurd dibêjin : Xewa di heyama guhartî de ( destpêka zivistanê , d.payîzê û H.W.D ) nexweşiyan peyda dike . û nexweşî rê li pêş BERAVÊTINÊ dûz û ronî dike .

**Birasozê Sirucî**

## Vestîvala Sindiyanê ya çandî



Erê rast e , mûzîk zimanekî cîhanî ye , ji ber wê mirov dikare di riya mûzîkê re , çand û şaristaniya gelê xwe bi gelên cîhanê bide nasîn.

li 6.8.2010 an , li " Tertûsê" gundê "Melace" , vestîvala S dî hate lidarxistin . Mîvanê vestîvalê yê herî serekîn mûzîkvanê Kurd ê cîhanî û bi nav û deng"Dilşad Se'îd" bû . Wî bi kemana xwe , çend kîteyên mûzîka xwe yên dengdayî û bi hesteke nazik pêşkêşî vestîvalê kir , û pê beşdarên wê kêfxweş û sermest kirin . Ji wan kîtên mûzîkê yên navdayî : Vahîn ( navê keça wî ye ) , xeceriyê , şivan û kevok bûn.

Hêjaye em berbiçav bikin , ku hejmara niştiyên gundê "Melace" /600/ e, û dora /2000/ kes ji gundên derdorê û hemî parêzgehên Sûriyê li vestîvalê bûne mîvan . Ji wan beşdaran ev hunermend , şêwekar û mûzîkvanên bi nav bûn : şêwekar "Berhem Haco" – ji Qamişlo- , mûzîkvan " Wesîm Miqdad rêvebirê tîma 'Ewic' ji şam . Mûzîkvanê kemanê "Tarêq îd" , ji amojgeha bilind a mûzîkê ya şamê " Omer Ubêd " şagirtê mûzîkê ji Humsê . Van herçar bîneran pesneke pir hêja dane mûzîka Dilşad Se'îd , ku kanîbû mûzîka xwe ya xweşik û bi wate mîna ava kaniyan a zelal û xerbî û xunava berbangan , bi hêsanî derbasî hinavên beşdaran bikira . Herweha wan tekûz dikirin , ku mûzîka xweşik û nazik , sînor û bendên di nav çandên netewan de hildiweşîne û wan ji hev ve nêzîk dike

**-Memê Alan-**

## Mirinek Sedemên xwe ne diyar in

Riyad Ehmed Xelîl ji Efrînê , gundê Satiya , zayîna wî 1968 , tevî du zarokên wî di mal de , li cindrêsê piştî cejna Newrozê têne girtin .

Li pêncşemê 26.8.2010 an nûçeya mirina wî di zîndanê de dighê merivên wî , bêyî ku sedemên mirinê ji wan re bêne xuyakirin . Herweha cendeka wî jî nedan xwediyan . Piştî du rojan ji nişkave , berbanga şemiyê 28.8.2010 kat 4.30 , bi dizî wî di goristana gund de vedişrin .

Bi nave Newrozê em doz dikin ku sedemên mirina Riyad Ehmed bête diyarkirin , û herweha Sersaxiya xwediyên wî dikin

www.arsivakurdi.org

# AGIRÊ NEWROZÊ

**Canşêrê Cinciqê**

Em li herêma Efrînê , gundê Çeqela bûne mîvan , da ku , em û zarokên xwe cejna *NEWROZÊ* ,li wir bikin . Efrîn buhuşta zemînê ye, Newroza wê pir xweş e, û sîmfoniya Buharê ye.

Şemiyê \ 20 \î Avdarê \ 2010 an , me çend navseran – bi alîkariya xortên gund – agirê Newrozê li ser çiyê dada , û li dorê çepik ,stran û dîlanokek gerand…Piştre em daketin mala mazûvanê xwe , Bavê Mehabad , ew jî , hevalekî minî , ku em ji zû ve têkildarê hev in .

Li ber mala wî, gundî civiyan û govenda êvara Newrozê li ber dengê dahol û zurnê li dar xistin. Govendeke pir xweş û geş bû , û bi rengên Buharê hatibû xemlandin.

Piştî govend – bi xêr – bi dawî bû , em komek jin û mêr , li malê , rûniştin , û guftûgo li ser Efrîn û Cezîrê vebû , min jî xwest berê pirsê bidim wan , û min got : Agirê Newrozê li Cizîrê – dema berê – pir bi zehmet û metirsî dihat dadan ,û pir kes ji bo wê zindan û eşkence dibûn, helbet li Efrînê jî wilo bû, ma ne?.

Kalek li hember min rûniştibû got: Belê wele xarzî rast e, li Eefînê jî hana ( wilo ) bû, ka ez çîroka rehmetî birakê xwe Ehmedê Hecfîlik bêjim: Ez karim bibêm ku, ew û herdu rehmetî - Mihemed Bekirê Mamedê(Mijo) û Heyderê Êhoyê Mamedê- ev her sê li gundê me Çeqela, di Partî de xeleka yekê bûn , birayê min Ehmed û herdu hevalên xwe, li rêka heps û zindanan diçûn dihatin . wan ji sala 1960î ve û berî wê, dest bi karê KURDAYETIYÊ kirine… Van camêran her Newroz Agir pêdixistin ,ji ber wê jî pir caran hatin girtin û ,polîsan ew dan bin ço û kotekan .

Xalo berdewam kir : Piştre polîs ferman da ku, ev çend kes ,êvara Agiran , wê li ((Mexferê)) , yan li mala Mixtêr ,wê xewkin…. Ne şaşbim Newroza 1961ê bû ,êvara agiran Ehemedê me ji mal derket ,,ji dê û bavê xwe re got: Diçim mala Mixtêr , sibe Newroz e ..Lê ew diçû êgir dade , bi rêve rastî Ehmedê zîno tê – ew jî gundiye-jêre dibê : Here rûne , derim avekê birjînim û têm –hema li pêşiyê kembera xwe sist dike … Roja din sibê polîs hatin, gundî komkirin û pirsîn: Kê Agirê QUZELQURT a Newrozê dadaye?.. Kes li xwe mukur nehat .. Paşê kemberek piştê raber kirin û gotin: Ev ya kê ye ? ..Dîsa kes mukur nehat , lê min û Ehmedê Zîno naskir ku ,kember ya Ehmedê me ye –ji leza re li şûna xwe , li ber êgir hiştibû- me zanî yê ku, agir dadaye Ehmed e !!.. Polîs , nişkave ,piyê xortekî girt û gêrkir û bi zirt ço rakire jor û got : Welah emê we gişan bidin bin çiwa, ta em naskin yê agir dadaye kî ye!… Wê gavê , yekî bankir : Bisekinin , bisekinin , Ez im û kember jî ya min e (Ehmdê me bankir)…

Xalo keserek mêranî kişand û got : Van bêbavên ŞURTE , EHMED dan ber ,çov ,sîle û pehnan û ew birin. Lê hîn dengê wî di guhên min de ye dema ji min re digot : Memo, keko metirse ezê vegerim ,û, şiyandin zindanê, ji du heyvan bihtir -wê carê- di hepsê de ma… Xalo bihna xwe berda û got : Rehmetî \ 35 \salî çû rehmetê. Ez dibêjim nexweşiya wî ji zindan û kotekên pir bû .. Îcar , xwarzî!.. Agirê Newrozê, li cî yê û bi germiya dilên xebatkaran gur bûye.

**Ehemedê Hecfîlik:Xebatkarekî ji gundê Çeqela- Herêma Eefrînê, sala 1944an li wir bûye,,1960î yan berî wê ketiye nav refên Partî , û ma endam , ta 17\12 \1979 an, koç barkir, û li goristana Cindirêsê hat veşartin.**
**Mihemed Bekirê Mmamedê ( Mijo ) û Heyderê Êhoyê Mamedê : Du xebatkarb û ji gundê Çeqela bûn .. Milo , berî çend salan , termê wî yê pîroz ji Ewoipa hat , û li Çeqela hat veşartin.**

www.arsivakurdi.org

nemaye ji ber ziwabûna wan av û çema ji ber kêmbûna barîna baranê li çiyê .

- Lawir : Ji ber peyda bûna xakek têr gir û Kendal û newal û gelekê fireh û bê pariya wê xakê ji cot û hilkirinê , û zengîniya wê bi hemî corên geya di çiyê de , ew xake bûbû cihek hêja ji peydabûna hejmarek lawirên bejî re û ji xwedîkirina Lawirên hûger re , û Lawirên hûger yên li wir dihatin xwedîkirin û heya neha jî tên xwedîkirin li wir ji aliyê xelkên herêmê ve Mih , Bizin , Çêlek û Gamêş . Ji aliyê Lawirên bejî ve . Hejmarek Lawirên bejî li wir peydadibûn di berê de wek , Keftar , Gur , Torî , Beraz , Rûvî , Xezal , Kîvroşk , Sîxur û Jîjo û neha ji xeynî Xezalan , ev Lawire hemî li wir peydadibin lê bi hejmarek gelekê kêm li gor berê .

Ji aliyê balinde ve : gelek balinde li wir peydadibûn wek Sisyark , Alçîn , Kevokên bejî , Lekleg , Mirîşkên avî , Kundo û Beytik û dîsa neha piraniya van balindan li wir peyda dibin , ew jî bi hejmarek gelekê kêm li gor berê . Tevlî van hemyan gelek corên Maran , Dûvpiştkan , Marmarokan , Nehengên piçûk , Gimgimokan û Mehîcekan li wir peyda dibin .

- Petrol di çiyayê Qereçoxde : Di 31 / 3 / 1956 kompaniya Necîb Menhel destpêkirina karê lêgeryana petrolê û kolana bîrên petrolê di çiyê de kir , û karê vê kompaniyê berdewam kir heya 5 / 10 / 1958 an , û bi karê vê kompaniyê bi cara yekem petrol hate dîtin di çiyayê Qereçox de û di Sûryê de û dûv re mafê lêgeryana petrolê di çiyê de , hukumetê da kompaniya Konkordiya Elmanî û vê kompaniyê karê lêgeryanê û kolanê di çiyê de berdewam kir heya sala 1962 an , û ji vê dîrokê ve û heya neha kompaniya Sûrî ya petrolê karê lêgeryanê û kolanê di çiyayê Qereçox de berdewam dike .

Di gel van hemî gotinan , çiyayê Qereçox buhar û havînan dibe seyrangehek xweş û delal û gelek xelkên herêmê rojên xwe lê derbas dikin û bihna xwe lê fireh dikin , û nemaze piştî çandina aliyê başûrê çiyê bi darên Sero û Sinoberan Bi dawiya vê gotarê , hêvîdarin em di riya vê gotarê re gihabin armanca xwe , ew armanca naskirina xwendevanan û gelê Kurd bi çiyayê Qereçox û hêvîdarin kêmasiyên me cihê lêborîna xwendevanên mebin .

**Jêderên gotarê :**

**- Ronîkirinin li ser tevgera Kurdî di Sûryê de ,Mamoste Ebdul Hemîd Dirwêş .**

**- Kovara taqa , ya wîzareta petrolê li Sûryê .**

**- Helbest û stiranên Kurdî yên kevnare .**

**- Ji devên kala û xelkên herêmê , bi taybetî Muhemed Reşîd ji gundê Sêgira .**

**- Tilvizyona Kurdistan .Tv .**

25 / 12 / 2007

**Ev gotar ji malpera NEWROZê hatiye wergirtin**

## Dhmahîk : Nameya…

, hûn dê bibine Mandêlayê Turkiyê û xwedî cîgehekî rêzdar di dîrokê de, weke çawa Nêlson Mandêla li Başurê Efrîka bi riyên aştiyane çareserî peydakiribû , cî girtibû , û dîrok jî her dê wî bi bîr bîne û sipasiya wî bike , vêca, hûn jî dikarin xwediyê rol û cîgehekî weha bin ).

Hêjayî gotinê ye ku balyozxana Turkiyê li Londonê erê nekiribû ku nameya Toto werbigire , lewre jî, şandeka li ser navê birêz Toto biryar dabû ku wê di riya balyozxana dewleta Başûrî Efrîka re , dê wê nameya dîrokî bighîne destê Erdogan .


Dêzmon Toto li sala 1931 an li Başûrî Efrîka ji dayîk bûye , têkoşerekî navnetewî , bêhempa li dij nijadperestiyê li seranserî cîhanê hatiye nasîn . Li sala 1984 an xelata Nobêl bona aştiyê wergirtiye , ji bilî gelek xelatên dî , û hê serokatiya komîta aqilmendan dike . Ev komîteya he, ya ku kesayetiyên xwedî rol , pir navdar û naskirî , mîna pêşewayê başûr Efrîkayî Nêlson Mandêla , serokê Emrîkî yê berê Jîmî Kartir û sekreterê giştî yê Netwayê Yekbûyî yê berê Kofî Enan di çerçewa endametiya xwe de hembêz dike .

**Sînorê Yekta**

www.arsivakurdi.org

# Geya di bin keviran de namîne!

**Rêberê Silîvî**



Kuro wa Silo..! De ka were cem min da em li ber siha vî dîwarî qasekî rûnin, ji xwe re basa dengûbasên vê dinyayê bikin, ka çi heye, çi tune ye. Ma çi bela te ye vê havînê tu ketiyî qulika xênî malava?!..

Silo ji hundir derket û hate nik Xelo, silav dayê û li kêleka wî rûnişt. Qotiya tûtinê ji berîka xwe derxist, çixarak jê pêça xiste tîrikê û agir berdayê, dû û dûman bi ser serê xwe xist, û got:

-Ha Xelo...Vaye ez hatim, tê çi ji me re bêjî, çi ne bêjî?. Ez pêjna wê yekê dikim ku hin gotin di bin zimanê te de hene, de ka bêje bê çi di tûrikê te de heye, ez li te guhdar im.

Bi ken Xelo got:

-Bi Xwedê û pêximber gotina te rast e...Îro danê sibehê ez li bajêr bûm, li civatekê hate gotin ku dibe nêzîk fermana 49an bête guhertin..!!Ne tenê wilo, belkî ew ji kokê ve rabe. Dema min ew gotin bihîst, ji kêf û şahiya dilê xwe, min bawer nedikir ku ez bigihime gund da mizgîniyê ji te re bînim. Eger ev gotin rast be, tê karibî xaniyekî li bajêr ji kurê xwe Cano re bikirî li ser navê wî tomar bikî û wî tê de bi jin û mal bikî. Bi rastî, ji dil û can kêfa min hat. Ma tu çi dibêjî Silo?!

Silo got:

-Kekê Xelo, tu rast dibêjî, ez ji te bawer dikim, lê mixabin, gotina bav û bapîran ya dibêje***"Xweş xeber e, lê min jê ne bawer e"*** tê bîra min!.Bi Xwedê û pêximberan, ez bi xwe nema hîç tiştekî ji gotin, soz û peymanên karbidestên vê dewletê bawer dikim. Baweriya min nayê ku ewê ji bo me Kurdan qenciyekê bi tenê jî bikin, yan ji derd û kulên me re, ji birînên me yên kûr re li hetwan yan melhemekê bigerin!! Ta ji wan tê, ew me diguvêşin da xwîna me biwerive rewa di laşê me de nemîne, her ew berê me didine çamor û teqanê da em tê de noq û winda bibin!!. Xelo ma qey hêj baweriya te bi gotinên wan tê? Ma qey nayê bîra te beriya çend salan, piştî dora 50 salî ji nû ve ew li xwe hay bûne ku ne heqî li Kurdên ku nasnameya wan ji wan hatiye kişandin bûye û qaşo nêzîk ewê wî mafê wanî rewa li wan vegerînin! Lê xuyaye "***Gotinên êvara dikevine qulên dîwara***"!!, dîsa weke her car, soza xwe xwarin!.

Xelo yê reben siyaset -miyasetê nizane, lê tiştê ew dizane li ber çavan e ku çavsoriyeke bê sînor li Kurdan dibe, ji ber biryar û kiryarên karbidestan nema nan bi dest wan dikeve, ne jî debara wan dibe. Bi dehan malbat bi hev re bar dikin, gundên bav û kalan li şûn xwe dihêlin û diçin bajarên mezin, li wan deran, ew toşî hemî cûreyên perîşanî, xizanî û windabûnê dibin, xulamtiya xelkê dikin!!...Ew di dilê xwe de dibêje: Hema bi xwedê û pêximberê(Umetê) gawir jî vê yekê nayinin serê mirovan!!...Xelo yê belengaz, di nava gumanan de kûr û dûr çûbû dema Silo jê pirsî:

-Ha Xelo biracan ma gotina min ne rast e?!.

- Kekê Silo, bi Xwedê tu rast dibêjî, lê ez belengazê xwedê hema ku gotineke xweş ji kê dibihîzim, zû bi zû ez bawer dikim. Tu dizanî ku xwendina min jî tune ye, hema te çend pitik xwendine, tu cilika xwe ji avê derdixî!!.. Lê keko, pêşiyên me gotine"Geya di bin keviran de namîne" û piştî zivistanê Buhar e!.

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org